Written by rwarvin
Tuesday, 09 February 2010 11:07



Dayika Kurd Mîna Qazî: Ez wê rojê bi sed salan naguherînim... Warvin - Taybet: Xanima Kurd Mîna Qazî heya dawiya jiyana xwe, armanc û helwesta niştimanperweriya xwe qet berneda. Li ser vê hindê hem di çaxê dewleta Pehlewiyan û hem jî di çaxê desthilatdariya dewleta paşverûya komara Îslamî li Îran çend caran hat girtin û zîndanîkirin. Di girtîgeha dewleta Xumêynî de bi wî temenê xwe yê daketî pir îşkence û tehqîr li wê hatin kirin. Hemû gunehê Mîna Qazî Kurdbûn û helwesta wê ya niştimanperweriyê bû. Herwiha sûçeke din jî ew bû ku Mîna xanima serokkomarê Kurdistanê pêşewa Qazî Mihemed bû.

Dema dayîka Kurd Mîna Qazî li ser rewşa gelê Kurd diaxivî, tim wiha digot:

" Ji min re soz û peymana yekgirtina Kurdan bidin, daku ez jî ji we re mizgîniya dewleta serbixwe ya Kurdistanê bînim. Ji ber ku yekbûn û hevgirtina hêzên siyasî yên Kurdistanê, dermanê hemû derdan e. Eger gelê Kurd di navbera xwe de yekgirtineke bihêz pêkbîne, çêbûna Kurdistaneke serbixwe karekî hêsan e. Ez bawer im pir dereng nakişîne, ku gelê Kurd jî yê di cîhanê de bibe xwediyê pênaseyek netewî. Hesreta serokkomarê Kurdistanê pêşewa Qazî Mihemed jî ev xwezî û hesreta dîrokî bû...".

Mîna Qazî ku di nava gel de bi (Daye Xanim) dihat bangkirin, xanimek giran û bi hurmet bû. Gel pir jê hez dikir. Ew di dîroka hevçerxa Kurdistanê de mêjûnameyek zindî dihat hejmartin. Pir zana û rewşenbîr bû. Haya wê ji cîhanê û rewişa bizavên siyasî yên Kurdistanê hebû. Xema wê ya herî giran „bindestiya Kurd û Kurdistan“ê bû.

Dema ew pêhesiya ku li bakurê Kurdistanê di nava refên gerîla de keç û jinên Kurd li dijî dewleta Tirk şer dikin, pir şabû û hertim digot:" Niha êdî ez xelasiya gelê Kurd nêzîk dibînim, ji ber ku jina Kurd jî mîna mêran derketiye serê çiyan, bi siyaset jî xebatê dide meşandin. Xwestek û armanca me ya herî girîng di çaxê Komara Kurdistan de ji damezirandina „Yekitiya Jinên Kurdistan“ jî beşdariya jinê di hemû Kar û barên civatê de bû."

Di hemû salên reş yên seedema Pehlewî Mîna Qazî weke dayikeke dilovan evîndara doza Kurdistanê bû. Piştî şoreşa gelên Îranê û têkçûna desthilatdariya dewleta Şahenşahî li Îranê, Rojhilatê Kurdistanê jî ket destê Kurdan. (Daye Xanim)ê dîsan jî dest bi xebata xwe kir. Wê dixwest di derfetên zêrîn de ji bo zarokên xwe karekî bike. Lê ev karê desthlatdariya Kurdan li ser Kurdistanê vê carê jî zêde nedomand û di salên 1979, 1980, û 1981an de, piştî şerên giran Kurdistan dîsa kete jêr desthilatdariya dewleta Komara Îslamî. Bi destûra desthilatdarên Komara Îslamî bi hezaran Kurd hatin kuştin û bi hezaran jî bi darê zorê di girtîgehan de hatin tîrbarankirin an jî îdamkirin. Dayîka Kurd Mîna Qazî jî di sala 1986an de nêzîkî salekê di bin çavdêriya beşê parastina Komara Îslamî ya Îranê de hat girtin. Sedemên girtina wê, ew bixwe jî nizane. Ji ber ku ew li derveyî malê bi şêweyekî nihênî ji aliyê beşê parastina Komara Islamî ya Îranê ve hat revandin. Herçend zêdetir ji 70 sal temenê wê bû, lê dîsan jî gelek zordestî û êşkenceyên giran li ser laşê wê hatin kirin. Sivkatî, xeberên nexweş û bêhurmetiyên mezin pêre

kirin. Berpirsiyarên îdareya îstixbarata Îranê bi eşkerahî jêre gotibûn:" Eger mêrê te (Qazî Mihemed) nebûya, me di Îranê de qet problem(pirsgirêk)a Kurd û Kurdistanê nedibû."

Piştî wê bûyerê heya demeke dirêj, dayîka Kurd Mîna Qazî mafê derketina ji Îranê nebû û tim di bin çavdêriya beşê parastina dewleta Îslamî de bû. Çaxê di sala 1988an de (Ifeet)a keça Mîna Qazî li welatê Siwêdê bi destê hinek terorîstên dewleta Îranê hat şehîd kirin, dîsan li Îran û Kurdistanê jî mafê serexweşiyê(tazî dananê) nedan malbata wan û heta ew ji aliyê dewletê ve hatin tehdîd kirin.

Di 17ê reşema sala 1998an de li bajarê Mihabadê bi dinyayek hesret û kûl Mîna Qazî jî gehişt rêza nemiran û bi yek carî xatirê xwe ji gelê Kurd xwest.

Di roja wefat û veşartina wê de bi hezaran kes li ser goristanê amadebûn û bi merasimeke taybetî li goristana bajarê Mihabad hat veşartin. Herçend bi fîzîkî ew niha ne di nava gelê xwe de ye, lê wek ku helbestvanekî Kurd dibêje:" Namirin! ewên di dilê gelê xwe de dijîn."

Gotinên wê qet ji bîra min naçin. Werin em bi hevre li dayika xwe guhdar bikin ka ji mera çi dibêje: _ Daye Xanimê jiyana we bi jiyana Pêşewa Qazî Mihemed ve girêdayiye, tukes ji wê nêzîktir li pêşewa nebûye, bîr û dîtinên wê çi ne li ser taybetmendiyên exlaqî, civakî û olî yên pêşewayê nemir? Bi xelkê re çawa di dan û standinê de bû? M. Qazî: Di derheqa taybetmendiyên pêşewa Qazî Mihemed û di bara sirûşt û exlaqê wî de, di hêza min de niye ku bikarim dîtin û ramanên xwe li ser beyan bikim. Ji ber ku ew mirovekî pir mezin bû. Gelek xwende, zana û têgehiştî bû, mirovekî leheng, cesur, bi cerg û netirs bû. Pêşewa werzişkar(sporvan)ekî bihêz û qehreman bû, siwarkar û melevanekî pir zîrek bû. Beriya ku bibe serokkomarê Kurdistanê jî, wek min got, ji ber ku ji malbateke mezin bû û li Mihabadê di nava gel de qezawet dikir(yenî qazî bû ), mirovekî gelek bi hurmet bû. Gel pir qîmet dida gotin û şîretên wî. Di nava hemû Kurdên Kurdistanê de bi hurmet û rêz bû û gelek dihat hezkirin. Wê demê weke niha nebû, tenê mirovên zana û mezin dikarîn di nava arêşeyên(pirsgirêkên) gel û çareserkirina wan de navbeynkarî û qezawetê bikin. Karê herkesî nebû û biryar bi zehmet diketin pêvajoya kirinê(piraktîkê). Hemû kar wisan bûn.

Beriya ku Komara Kurdistan li Mihbadê pêk bê, baş li bîra min e. Şev û rojan Pêşewa pirtûk dixwendin, xebata siyasî dikir û tim digot:" Xwedayê mezin! Em çawa dê bikaribin ji gelê xwe re xizmetke baş bikin, ku bikaribe ji destê neyaran rizgar bibe û rewşa jiyana Kurdan jî bê guherandin... ". Ew hertim di fikra gelê xwe de bû, dema nimêjkirinê jî çend seatan di’a û minacat dikirin.

Rojekê wî gote min:" Ez tenê ji bo rizgariya gelê Kurd têdikoşim û xebatê dikim. Rojekê ezê sedî-sed (100%) berhemekî mezim wek mîras ji gelê xwe ra bi cih bihêlim û dudestî pêşkêşî gelê xwe bikim. Ez qet ji bo bidestanîna meqam û menseb(deshilatdariyê) xebatê nakim..."

Di 25ê Rêbendana(Januar) sala 1324ê hetavî (22. 01. 1946) de jî dema Qazî Mihemed çû ser bilindahiyê daku Komara Demokratîk a Kurdistanê rabigehîne (îlan bike) wiha got :" Gelê min yê birêz û qehreman, çûna ser text, çûna ser darê jî pêre ye, ez li vir çûme ser text û li vir jî yê

bême kuştin, ez viya baş dizanim..." Êca qisa(axftina) wî bi cih hat û weke got salekê piştî vê bûyera mêjûyî li meydana Çarçira bi destê dagîrkerên Kurdistanê hat şehîdkirin. Qazî Mihmmed piyawekî(zilamekî) xwedî exlaqekî nerim bû, çimkî dayîma serûkarê wî bi xelkê re bû û beriya Komara Kurdistanê jî di herêma Mûkriyan de ji ber qezawet û biryarên xwe yên bi edalet(dadmendane) di nava gel de pir dihate hez kirin. Sebebê canfîdayiya wî jî yê herî mezin evîna gelê Kurd bû, ku heta canê xwe jî di riya gel de fîda kir.

_ Lê di nava malê da mirovekî çawa bû?

Willahî di nava malê de jî bi min re mîna hevalekî bû. Her dem digote min (Birale) û ez bi navê Birale bang dikirim. Min heft keç li ser yek (li pey hev) anîn ser dinê, piştî xilasbûn û hatina keçên min ya ser rûyê dinyayê, qet tucaran negote min zarokê te kur e an keç e? Ji ber ku mirovek bû ku çi ferq di navbera jin û mêran de nedidît. Hurmetek pir zêde ji jinan re digirt, ji keçên min re weke tenê kurê me (Kurî Reş- Elî ) hezdikir. Qazî mirovekî gelek dîndar bû, girîngiyek zêde dida paqijî û saxlemiya civakî û şexsî ya xwe, cigare qet nedikişandin, vexwarinên elkolîk tu caran venedixwarin, karên heram nedikirin, ji bilî min tu jinên din neanîne (bi keseke din re nezewciye). Çima behsa viya dikim? Ji ber ku di wî çaxî de di nava binemalên dewlemend û mezin de resim û adet bû ku zilamên mezin yên binemalê bi çend jinan re bizewcin û ev kare ji bo wan rengekî mezinatiyê bû, lê bi rastî raman û hizrên Qazî li dijî taybetmendiyên civaka feodalîzim û axatiyê bûn û mafekî wekheviyê ji bo jin û mêran qayil bû. Tim jî digote min :"Birale wisa fikir meke ku tu malxa min î, ez bi çavê hevalekî li te dinêrim û dîtinên te li ser her karekî ji bo min girîng û bi mifa ne..." Pêşewa mirovekî pir zana bû, agehdarê rewşa ramyarî, civakî û aboriya cîhanê bû, li ser guherandinên ku di cîhanê de çêdibûn tim xeberdar bû. Bi heft zimanên Inglîzî, Rusî, Firansewî, Erebî, Tirkî, Farsî û Azerî dikarî bixwîne. Di çaxê serokkomariyê de jî dest pêkirbû zimanê Espiranto dixwend. Ji bo îspatkirina vê îdiaya xwe, hûn dikarin li pirtûkxaneya wî binêrin û bi wan zimanên ku min nav birin, nivîs û pirtukên li ser babetên cur bi cur peyda bikin. Pirtûkxaneya Qazî di Kurdistanê de û bi taybet di nava çîna rewşenbîr de pir bi nav û deng bû. Hemû cure kitab di nav de dihatin dîtin. Niha jî gelek pirtûkên Pêşewa mane û di mala keça min de ne. Pirtûk bi giranî felsefî, exlaqî, dînî(olî), ramyarî û zanistî(ilmî) bûn. Mixabin gelek ji wan jî ji nav çûn...!!

_ Roja ragehandin(îlamkirina) komara Kurdistanê hûn li kûderê bûn ?

M. Qazî: (Bi rûyekî xweş û tejî hêvî li min dinêre û dibêje): Yadî ew rojane be xêr bêt - bîra wan rojan bi xêr be. Hûn dizanin rewşa civakî wê demê li Kurdistanê çawa bû? Birastî mîna niha nebû, her çend niha jî rewş zêde nebaş e, lê ji ya wê demê baştir e. Li roja îlankirina Komara Kurdistan li meydana Çarçira ya Mihabadê ji seranserî Kurdistanê serokêl û eşîret, mirovên maqol û mezin li dora hev kom bûbûn. Xûyaye piştî merasima vê roja dîrokî gelek mêvan bi Qazî re vedigerîn mala me. Ji aliyekî din ve jî li gor qanona eşayêrî, eşîret hinde azadiyê nadene jinê ku biçe di kar û barê zilaman de dexaletê bike. Ez jî weke gelek jinên din di wê roja mêjûyî de li mal bûm. Pêwîst bû hem ji bo mêvanên ku ji herêmên cur bi cur hatbûn Mihabadê, xwarin û pêwîstiyên din bên amadekirin û him jî ez li ser çawaniya karê birêvebirina mêvanan radiwestiyam. Hem jî di wê rojê de gelek jinên mezin hatibûn mala me û pêwîst bû em li cem wan bimînin. Ev di Kurdistanê de adet û resmê mêvanperweriyê ye. Lê baş li bîra min e, dema

me li pencereya mala xwe( ku dikeve aliyê Meydana Çarçira), li merasimê dinêrî. Bi hezaran kes li meydana Çiwarçira rawestabûn, rûyê herkesî geş û wê rojê lêvên me tevan bi ken bûnn, gel ji bo rojeke dîrokî xwe amade kiribû. Cil û bergên ciwan(bedew) kiribûn ber xwe. Ji Makoyê siwarên êla Celaliyan bi zîn û berzîn û kincên xwe yên rengîn, ji Kurdên derdora bajarê Xoyê jî êl û eşîretên Kurdan bi cil(kinc)ên bedew xwe xemilandibûn. Kurdên Selmasê, Urmiyê, Mergewer, Tirgewer û Somayê jî bi kincên cur bi cur xwe xemilandibûn. Di nava çavên siwarên Şikakan de mêrxasî dibarî. Ji Sine, Pîranşar, Şino, Bokan, Serdeşt û hemû deverên din yên Kurdistanê tev ji bo vê cejina pîroz, li gelê Mihabadê bûbûn mêvan. Şarê me bûbû mîna baxçeyê gulên reng bi reng. Wê rojê te digot qey hemû Kurdistan li Mihabadê ye...

Ez heya sax im wê rojê ji bîr nakim, bi qasî hezar salan ew rojên girîng û dîrokî ji bo min bi qîmet û rûmet in. Niha jî ez bi wan rojan şanazî û îftixarê dikim. (Daye xanim li vir bi girî bersiva pirsa min didomîne), heya wê rojê gelê Mihabadê ewqas Kurd di nava xwe de nedîtibûn. Mal nebû ku çend kes mêvanên wan nebin, ew roj ji bo me tevan, lê bi taybet ji bo Pêşewa Qazî xweştirîn roj bû. Ez wê rojê bi sed salan naguherînim, heya bimirim ezê ji bo wê rojê bikenim, bigirîm, hêsiran bibarînim, dê tim wan rojan bînim bîra xwe...

Belê herwiha wê rojê, piştî beyankirina damezrandina Komarê ji bo xwarina firavînê(nanê nîvrojê) şexsiyetên maqul û mezin bi Pêşewa re hatin mala me:

Qedirî Begê Diyarbekrî, Zêro Begê Herkî, Mele Mistafayê Barzanî, Reyîs Izzet Ebdulezîz, Mîr Hac, Mistefa Xoşnaw û ji hemiyan birêztir û mezintir şêx Ebdulah Efendî(Gîlanîzade) neviyê şêx Ûbeydulahê Nehrî û kurê wî kapîtan Seyîd Ebdulezîr Şemzînî bûn, ku tu caran ji bîra min naçin...

Kurê min: Ew roj rojên xweş û kêmtemen bûn... Zû derbas bûn... (Daye Xanim li vir jî demekê bêdeng dimîne û diçe nava derya xeyalên xwe yên kûr, ew carek din diçe Mihabadê û çaxê komara Kurdistan.... Ji bo zindîbûna xatreyên wê em jî demekê bêdeng dimînîn! )

We xweş behsa wê roja pîroz kir. Wê şevê dema Pêşewa hat malê ji te re çi got? Derheqa karê xwe de çi digot û aya keyfxweş bû?

M. Qazî: Belê, erê willahî pir kêfxweş û şa bû. Dema hat malê got: „Birale giyan (Her tim ji min re digot birale û sebeb jî ji ber ku tim bi çavê hevalekî xwe li min dinêrî), ezê ji bo Kurdistanê û ji bo gelê Kurd înşellah hemû karekî cî bi cî bikim, lê bi Xwedê sond dixwim ku ez bixwe tu wextekî naxwazim serokkomar bim, heya ez her karî ji bo wan çêdikim û karê welatê me bikeve ser rêya xwe û piştre ezê her tiştî pêşkêşî gel bixwe bikim, daku ew bixwe berpirsyariya qedera(çarenivîsa) xwe bigirin destê xwe û karê welatê xwe birêve bibin. Ez jî dê mîna xulamekî herdem di xizmeta berjewendiyên gelê xwe de bim".

Belê wê rojê xweştirîn roja jiyana me tevan bû. Kurd gehiştibûn armanca xwe, em wê rojê bextewertirîn mirovên cîhanê bûn. Serokkomarê Kurdistanê xwe bi xizmetkarê gel dihesiband û qet bi çavekî bilind li xwe nedinêrî. Erê willahî mirovekî wiha bû !

_ Di çaxê salek temenê Komara Kurdistanê de Pêşewa bi we re dikete nava têkelî û bi we re şêwir dikir an na? Bi wateyeke din ji bo pêşkevtina karê xwe pêşniyar û rexneyên we

dipejirandin an na? Ji kar û xebata xwe razî bû? Ji gel çiqas razî bû û aya qet gilî û gazinde li cem we dikirin ?...

M. Qazî: Belê ... Belê... Elbet mirovekî mîna Pêşewa Qazî Mihemed hertim û di hemû waran de bi min re dikete nava şêwir û têkeliyan. Heta di bara sefer û dan û standinên xwe yên siyasî bi mirovên siyasetvan re jî bi min re şêwir dikir. Bi rastî qîmeteke pir mezin dida mafê jina Kurd. Ez pir şa me, ku herçend demeke kêm bi wî hêjayî re jiyame jî, lê bi rastî bo min şanaziya herî mezin ew bû ku min bi wî re jiyana xwe ya hevpar dibire ser.

Dema di çaxê komara Kurdistanê de çû sefera xwe ya Bako(Paytextê Komara Azerbayican) keça min Fewziye bi xwe re bir. Dixwest keçên xwe jî hînî siyset û karê welatperweriyê bike. Her roj di bara rewşa cîhanê de bi me re diaxivî, bi taybet gelek bi keça me Îsmetê re mijûlî goftigo û xwendina pirtûkan dibû. Dawa dikir, ku keça wî ya mezin bibe siyasetvaneke mezin û ji bo doza gelê Kurd bixebite. Gilî û gazinde(gazince) jî pir kêm dikirin. Tim her tişt bi piratîk dianîn ziman.

Rojekê nemir Qazî Mihemed ji aliyê Serdarê Makoyê bo Daş Makoyê (bajarê Makoyê) hatibû vexwandin(dawet kirin), piştî vegerîna ji Makoyê digel serokwezîrê komara Kurdistan Hacî Bawe Şêx(Baba Şêx) (yanê kurê Seyîdê Zenbîlê) hatin malê. Li ber derî dema Pêşewa pêlavên xwe derdixistin, Hacî Bawe Şêx jê re got: " Qûrban şêxayetî û paşayetiya wiha nehatiye dîtin, dibî (divê) hinekî xelkê nerihet bikey, ku xelk bitirse...."

Qazî di bersiva wî de wiha emir kir:" Dibî (divê-pêwîst e) ez ji hemû dinyayê re îspat bikim ku bi lêdan û kuştinê tu tiştek nayê kirin, mirov dibî(gerek e) bi şêweyên demokrasiyane, bi şîret û nesîhetan bêne ser rêya rast. Mirov ewladê(zarokên) xwe çawa toşî zehmetî û nerihetiyan dike?!!. Ez dibî bi hemû kesan, bi dinyayê re bidim îspatkirin ku bi lêdan û xeberên nebaş (cinêw dan), bi derxistin û çêkirina nerihetiyan qet karek nayê kirin. Insan pêwîst e zarokên xwe bi şîret û nisîhetan baş bike(bîne ser rêya rast). Eger em bixwazin deshilatdariya xwe li welatê xwe berdewam bikin, gerek e li ser dilê gelê xwe hukimdariyê bikin, ne bi darê zorê hukimdariyê bikeyin..."

Herwiha hûn jî dizanin, di hemû çaxê temenê komara Kurdistanê de tenê yek kes hat kuştin. Bawer bike dema nîvê şevê bi telefonê xebera kuştina Xefûr Mehmudiyan dan Pêşewa, wê şevê heya berê sibê ji nerihetiyan xew bi çavên wî neket û qet xebera wî ji tiştekî tunebû. Hûn dikarin ji mirovên wî çaxî jî bipirsin ka ez rast dibêjim an na?....

_ Belê bi rastî jî di wî çaxî de ev karên wiha eşkera, ku di gelek pirtûkan de hatine nivîsandin, îspat dikin ku serokkomarê Kurdistanê mirovekî gelek rewiştpak, aştîxwaz û pir ji demokrasiyê hez kiriye. Dan û standina Pêşewa Qazî bi gel re di wî çaxî de rastiya gotinên we xûya dike. Ji ber ku li ser demokrasîxwaziya kesatiya pêşewayê şehîd min pir axiftin ji gelek kesan bihîstine...

M. Qazî: Belê rast e, dîsan ji bo nimûne di ti(çi) cihên dinyayê de nehatiye dîtin, ku di demjimêr(saet)ek diyarkirî de serokkomarê welatekî (ew jî di wan şert û mercên ku Kurdistan di wê demê de têde bû) hemû rojê sibehan ji xewê rabe û bi bêyî teşrîfat û îskurt bi piyatî(peya) here ser karê xwe ku heya radeyekê ji malê dûr bû. Hemû rojê sibê Pêşewa bi piya û wek mirovekî normal diçû ser karê xwe û qet weke mirovekî xwedî menseb li xwe nedinêrî. Baweriya

wî bi merdomsalarî(gelsalarî)yê pir hebû, qet xwe bilindtir ji xelkê normal nedihesiband... Mirovekî wiha bû.

Nimûneyek din ji exlaq û mirovperweriya Qazî jî dixwazim ji te re bibêjim:

Ji aliyê Kurdekî ve ku bi sefer çûbû Amerîka cotek pêlav(sol-kewş) bi xelat (diyarî - hediye) ji rehmetî Qazî re hatibûn. Wê demê malbatên Barzaniyan ji aliyê din yê Kurdistanê(başûrê Kurdistanê) ji destê dewletê reviyabûn û li Kurdistana Îranê belav bûbûn. Çend malbatên wan (nêzîkî 15 kesan) di mala me de dihatin xwedîkirin, lê ne ji bo wê hindê ku wan bixebtînîn û şul(kar)ên xwe bi wan bideyin kirin. Na! hemû malbatên wan bi destûra dewleta Kurdistanê di nava xelkê Mihabadê de hatibûn belavkirin û hemû pêwîstiyên jiyanê dabûn wan. Ji ber ku malên wan xirab bûbûn, lêqewmiyayî bûn û hertiştê xwe di rêya amancên bi rûmetên xwe de ji dest dabûn. Tenê canê xwe ji destê dewleta Îraqê xilas kiribûn. Ew hatibûn xwe avêtibûn hembêza Komara Kurdistanê. Êca di nava wê malbatê de keçek bi navê Xecîce hebû. Keça wê malê bû ku di nava mala me de bûn. Rojekê werzê zivistanê bû. Xecîcê ji min re got:" Xweziya niha pêlavên Pêşewa Qazî di piyên min de bûna, ez bi wan çûbama ser robar û min av anîba."

Min jî bi pêkenîn li cem Qazî behsa daxwaza Xecîcê kir. Nemir Pêşewa Qazî kerem kir:" Ka herin Xecîcê bangî vira bikin, bila bê cem min." Demek derbas bû Xecîce bi rûxweşî û bi ken hat. Xuya bû ku pir bi ecele hatibû û pêyên wê tev qor û terr bûn. Qazî pêlavên xwe ji piyên xwe derxistin, bi destên xwe kirin piyên Xecîcê û bendikê(benê) solan jî jêre girêdan.

Belê êca pêşewa Qazî Mihemed zilamekî wiha bû. Bi rehim û şefeqet bû, bi van pirensîpan bi gelê xwe re dijî û rojên xwe derbas dikirin. Di nava gel de jiya û ji bo wan jî canê xwe fîda kir. Ji bo Kurdistanê her tiştê xwe fîdakir. Heya dawiyê li ser soz û qirara xwe bû.

_ Xweştirîn xatre an bîranîna te ya bi Pêşewa Qazî re çi ye?

M. Qazî: Heya roja ku em bi hev re bûn, hemû rojên jiyana bi wî re ji bo min xweştirîn bîranîn û xatire ne. Me qet ji hev nerihetiyek biçûk jî nedît. Rojekê jî dilê min neêşandiye. Ema raweste, ez bîranîneke xweş ji bo te bêjim:

Dema ku komara Kurdistanê hat damezrandin, rehmetî Qazî gelek şabû, ji kêfan re hertim digot: “Xwedayê mezin, şukir ji bo te, ku em piştî bi hezar salan gehiştin xwezî û mafê xwe..."

Piştî wê li min nêrî û got: "Birale, êdî ne roja rûniştinê ye. Ez ji te dixwazim ku tu jî karekî bikî". Min jî bi ken jêre got: "Êca ez nexwende me û nikarim tiştekî bikim, çi ji destê min nayê...". Hingî li min nêrî, bi rûyekî xweş weke ku ji rûyê wî nûr û ronahî dibiriqî, li min nêrî û got:

„ Jinên dinyayê pir pêşverû ne, ramanên wan hatine guherandin, pêwîst e jinên Kurd jî bîr û rayên xwe biguherînin. Ez dixwazim li Mihabadê tu dest pêbikî û ji bo jinan jî yekitiyek bê damezrandin. Ger tu ku di nava gel de weke xêzana serokkomarê Kurdistanê têyî nasandin, dest bi kar bikî, ev karê te yê ji bo jinên din jî bibe teşwîq, ku werin qada xebatê. Zêr û zîwerên te ji bo çi ne?, hemûyan di riya welat û dewleta xwe de bi kar bîne. Divê ji bo ku nexwendewarî di nava jinan de bi dawî bibe, tu herî li kilasên(polên) dersxwendinê amade bibî, dersê bixwînî, daku jin û keçên Kurdan li te binêrin û bên dersê bixwînin..."

Min jî bi gotina wî kir û wek min berê jî got, me dest bi xebata xwe kir. Hem Yekîtî Afretanî(jinên) Kurdistan(YAK) hat damezrandin û hem jî me zibare(cîhad) li dijî nexwendewariyê da destpêkirin.

Ez wan rojên dîrokî û girîng qet ji bîr nakim. Hemû xweşî wê demê bûn, piştî wê heya roja îro min qet xweşî û xêr ji jiyana xwe nedîtin. Elbete serê gel û zarokên min sax be, qet kêmasiyên min tune ne, lê jiyana wan rojan tejî evîn bû, evîn bo welat, bo xebat, bo xizmeta mirovayetiyê...( Ji ber girîyê nikare axaftina xwe bidomîne ).

_ Niha temenê te bû 80ê sal, di dunyayê de çi miraz arezû) ya te heye?

M. Qazî: Ez daxwaza saxî û silametiya hemû keç û xortên Kurdistanê dikim. Arezûya min ya herî mezin dîtina serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye, lê ez niha pir pîr bûme, bawer nakim bi saxî vê arezûya mezin bibînim. Herçend baş dizanim, ku gelê Kurd di paşerojeke nêzîk de yê sedîsed (%100) pîroz bin, yê bigehin armancên xwe yên dîrokî. Hesreta min ya herî mezin ew e, ku rojekê Kurdistan tev bibe yek û dewleteke Kurdan jî di dinyayê de hebe...(Bi girî)... Ax ka ew roj, yê kengî bê?!...

Dema mirim, ez dixwazim mizgîniya azadiya Kurd û Kurdistanê ji bo serokkomarê Kurdistanê bibim bin axa Kurdistanê... Bawer bike ev mezintirîn daxwaza min ji hemû gelê Kurdistanê ye, ez tiştekî din ji we naxwazim... Roja ez mirim jî, min li jêr pêyên Qazî veşêrin, bila ez ji wî dûr nekevim (nikare biaxivê û bi dengekî bilind digirî)...

**Kakşar Oremar**

**Email: kakshar_oremar@yahoo.de**